
# BÛYÎNA ÎSA


Di wan rojan de ji Qeysir Awgûsto emir derket, diviya ku tevahiya xelkê bên hijmartin.
Ev hijmartina ku çêbû, ya peşî bû,
ku çaxê Kûrênyo walîyê Sûryayê bû.



Qeyser Awgûsto çi emir derxist?

.......................................................................


Herkes diçû bajarê xwe, ku navê xwe bide nivîsandin.
Ûsiv jî, ji bo ku ji mala Dawud û ji bavikê Dawud bû,
ji bajarê Nisreta Celîlê rabû çû Beytlehma Cihûstanê,
bajarê Dawud, da ku tevî Meryema dergîstya xwe
navên xwe li wir bidin nivîsandin.
Meryem jî bi Ruhê Pîroz bizaro bû.



Ûsiv û Meryem çûn kîjan bajarî?

..........................................................

Gava ew gihîştin wir,
rojên zarokanîna Meryemê temam bûn.



Gava ew gihîştin wir, çi çêbû?

.....................................................

Û wê kurê xwe yê nixurî anî, ew di pêçekê de pêça û di afir de danî, çimkî di mêvanxanê de cihê wan nemabû.



Çima di mêvanxanê de cih ji bo wan nemabû?

.........................................................

Û li wan deran, şivan hebûn, ku êvaran nobe li keriyên pezê xwe digirtin. Û milyaketê Xudan li wan xuyabû, rumeta Xudan hawirdora wan kir ronahî û ew gelek tirsîyan. Milyaketê Xudan ji wan re got: „Netirsin, çimkî va ye ez mizgînîya şabûneke mezin didim we, ya ku wê ji bo tevahîya milet be. Îro ji we re di bajarê Dawud de xilazkarek çêbû, ew jî Xudan Mesîh e. Bila ev ji we re nîşan be, hûnê zarokekî di pêçekê de pêçayî di afir de razayî bibînin“.



Kî di bajarê Dawud de çêbû?

.........................................................

Û ji nişkê ve tevî wî milyaketî ordîyek mezin ya leşkerên ezmên xûyabû, pesnê Xwedê dida û digot: « Li bilindahîyê şikir ji Xwedê re û liser erdê aştî ji wan re yên ku Xwedê ji wan raziye.



Çi ji nişkê ve li şivanan xuyabû?

……………………………………………………

Û gava milyaket ji wan dûrketin, û çûn ezmên, şivanan ji hevdu re got: „Werin, em heta Beytlehmê herin, vî tiştê bûyî, yê ku Xudan haya me pêxistiye bibînin“.



Şivan çûn ku derê?

.....................................................................

Û ew bilez çûn, heta wê dera ku Meryem û Ûsiv lê bûn û zarokê ku di afir de razayi dîtin.



Şivanan kî dît?

.........................................................

Û ji wê xebera ku ji wan re hatibû gotin, wan zarok naskir. Hemûyên ku ev tişt ji şivanan dibihîstin ecebmayî diman. Lê Meryemê ev tişt hemû di dilê xwe de hiltanîn û li ser wan difikirî.
Û şivan vegeriyan, ji bo tiştên bihîstîbûn û dîtibûn, yên ku ji wan re hatibûn gotin, pesn û şikirî didan Xwedê.



Şivanan çi ji Xwedê re dikir?

..........................................................

Çaxê heşt roj temam bûn, ew sinet kirin û navê wî Îsa danîn, çawa hê berî ku ew bizarobibe milyaket ji wê re gotibû.



Navê wî çi danîn?

..........................................................